

YEKRÊZIYA KURDÎ ÇAREYA BITENÊ YE



Şêrîn Dawûdî

PEYVA WELAT

Yekrêziya Kurdî Çareya Bitenê ye

Desteya sernivîs

Her kes dizane ku sedema sereke ji hemû têkçûn, binketin û bobelatên gelê kurd parçebûna wî ye. bi qasî ku gelê kurd têkoşîn di ber hebûna xwe û azadiya xwe de kiriye, û bi qasî ku li ber xwe daye. Her dem parçebûn bûye sedem ku wî hemû destkeftiyên xwe wenda kirine, û ked û xebata wî beravîtî kiriye.

Îro roj jî heman pirsgirêk û heman nexweşîya kevnar hîn di laşê gelê kurd de hazir e, vê pirsgirêkê bandoreke nerênî li derûna gel kiriye û bêhêvî di dilê wî de çandiye.

Ji destpêka kirîza Sûriyê ve ya ku bi şoreşekê destpêkir, û piştîre bû şerekî çekdar û navxweyî, tevgera kurdî ya siyasî li rojavayê kurdistanê nikarîbû bi berpirsyartiya xwe ya dîrokî ve rabe û bi yek helwestê têkiliyê bi bûyeran re bike. Rast e berî ku krîza Sûriyê dest pê bike, tevgera siyasîya kurdî parçe bû û rewşa wê pîr xerab bû, lê di qonaxê wisa hestdar û metirsîdar de jê dihat xwestin ku bi rola xwe rabe û gelê xwe û berjewendiyên wî biparêze.

Mixabin, tevgera siyasîya kurdî demeke dirêj bejewendiyên xwe yên partîti di ser berjewendiyên gelê xwe re girtine, û rê ji dijminên doza kurdî re vekir ku bikaribe planên xwe di riya wan re bimeşînin, bi vî awayî gelek ziyan gihande gel û gelek felaket bi serê wî de anî.

Li ser dirêjahiya deh salan bi hezaran ji gelê kurd yê Sûriyê jî bo parastina deverên xwe şehîd ketin, bi deh hezaran koçber bûn, bajarên Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî ji hêla dewleta Turkiyê ve hatine dagîrkirin, kurd ji malên xwe hatin derxistin, mal

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane



Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

û mulkên kurdan hatin talankirin, rojane tawan derheqê kurdan tene kirin, guhertina demografi li deverên kurdî berdewam e, destdirêjî li jinên kurd tê kirin, û hîn hebûna kurdan li Sûriyê li jêr gefê ye.

Îro roj jî hemû deman bêtir dijminên gelê kurd dixwazin piştî kurdan bişkinin da ku di pêşeroja Sûriyê de rola wan pûç bikin û mafên wan wenda bikin.

Lewra çareseriya mayî li pêşiya kurdan tenê yekîtiya wan e, tenê bi yekîtiyê yekrêziya xwe dikarin planên dijminan vala dirxin, û mafê xwe yê rewşa bide bixin, û ev ji bo kurdan derfeteke dîrokî ye.

Destpêşxeriya General Mezlûm Kobanî ya ji bo yekrêziya kurdî gaveke pîr giring û pîroz e, û derfeteke dîrokî ye, vê destpêşxeriyê xwîn bi rehên hêviyên gel ve berda. Lewra ji tevgera siyasîya kurdî tê xwestin ku vê derfetê ji dest xwe bernedin û yekrêziya xwe di zûtirîn dem de pêkbînin, û rê nedin hewldanên dijminan ku vê destpêşxeriyê xerab bikin, çimkî pêşeroja miletekî û çarenûsa wî girêdawî vê yekrêziyê ye. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution



QONAXÊN NOTA KURDÎ, GIRINGIYA WÊ DI MOZÎKJENIYÊ DE .

Gulal kasanî

Dr.Ebdella Cemal M. Seyîd dilşad û Qeredaxî..HD, ew jî bi şeweyekî Orkêstralî dibêjin. Divêt ku yên sazvan di warê newtedariyê de zana û jîr bin, ji ber vê yekê bandora Newteyê li ser pêşketina mozîka kurdî, heye.

Kurdên Ermenistanê: Di sala 1965'an de li Êrîvana Payîtext Cemîla Celîlî stranên Kurdî li ser amûra Mozîkî Piyano newtandine û pirtûkeke mozîkî çap kiriye lê wek ku Mamoste Kamîran dibêje gelek şaşî di newteyandina stranan de hebû, çimkî Cemîla bi zimanê Rûsî xwendin xwe tewaw kiriye.

Rojavayê Kurdistanê: Mozîkjen Melfono Gebriyêl Es'ed mamosteyê Dr.Mihemed Ezîz Zaza ye, wî dîlanên Orfelî Newtandine, paşê Dr.Zaza di sala 1959'an de girûpek ji stranên Kurdî newtandine, paşê Hinermend Se'îd Yosiv ; dema ku li Libnanê bû, li ser destên Mozîkjen Dexîl Fereh, fêrî Newteya Mozîkî bûye, paşê Mozîkjen Şêrzad Omer strana Kurdî newtandiye, paşê Bavê Evîn; ew bixwe ji bajarê Tirbespiyê ye, paşê Mozîkjen Kamîran Ibrahîm di sala 2003'an de gelek stranên Se'îd Yosiv û bi sedan ji stranên Kevnetorî Newtandine; ta niha 4 pirûkên wî yên stranên newtekî û fêrbûna mozîkê hene: 1-Keskesorê.2-çilawaz.3-çend waneyek li mozîkê "tiyorî û piraktîk" .

4-intlocya stranên kurdî.

paşê Hisên Ibrahîm girûpek ji stranên Hinermend M.Şêxo Newtandine.

li ser giringiya Newtkirina Stranê Mamosteyê mozîkê Kamîran dibêje: Newtedariya stranê pir girng e bo fêrbûna mozîkê û pêşketina strana Kurdî, bi tayibet di vê serdemê de ev jî alîkî ve, ji aliyekî din ve giringiya newtedariyê bi mazorên xwe xwiya ye, tê xwiya kirin gelo ew awaz ji ku hatiye. Dêmek, newte dide xwiyakirin ka ev awaz ji Tirkî hatiye yan ji Farisî hatiye yan jî, ya hinermend e, wî afrandiye.

Serdema Beriya zayînê

3400 sal BZ, li parava deriyaya Spî Noteyeke Mozîkî bi zimanê Horiyan sirûda xweda Nîgal hatiye nivîsanidin.

Her wiha di Sala 1948'an de şandereke lêgerînê ya Berîtanî ew tabloya mozîkjeniyê ya bi tîpên Nivîsandina Someriyana "Bismarî" hati bûye dîtin.

Serdema nûjen

Başûrê Krdistanê: Yekem car Noteya Kurdî li ser destên henermendê Suriyanî Cemîl Beşîr di sala 1946'an de hatiye nivîsandin.

Sala 1956'an Yekem elboma hinermendê Kurd Şemal Saib bi alîkariya Cemîl Beşîr ya strana navdar " Her leylê her leylê Kurdistan" hatiye newtekirin û tomarkirin.

Sala 1960'î Ceml Beşîr pirtûka xwe ya perwerdehiya amûra Ûdê çapkiriye, di wê pirtûkê de girûpek ji stranên Kurdî yên Newtekirî, hen e.

Li bajarê Silmaniyê yên ku paşî Cemîl Beşîr strana Kurdî Newtandine: Qadir Gîlan û Şemal Saib û hinek din jî hebûn.

Li başûrê Kurdistanê bi tayibet li Hewlêr û Silêmaniyê Mozîka Kurdî pir pêşketiye, zanîngeh û navendên fêrbûna Mozîkê hatine saz kirin, her wisa komên Sêmfonî û Orkêstralî jî çê bûne, strana Kurdî bi şeweyekî orkêstalî tê belav kirin, çimko ne bi newtedariyê be, newte nayê xwendin, ji ber wiha strana kurdistanê Başûr ya orkstralî li pêş e, ji wan mozîkjenan yên newteder

Her wiha mamoste Kamîran Ibrahîm di berdewamiya axaftina xwe de dibêje:

Dema ku em bixwazin pîvaneke mozîkî dinav bera 2 stranên de çê bikin, divê ku her 2 stran bêne newtedayin dê xwiya bibe, şaşiyên kat, ritim û hevokên stranê, wê xwiya bibe ew awaz Kurdî ye yan ne kurdî ye.

Dengbêj Îmad Xelef li ser vê mijarê baweriya xwe ji Guvara Welat re anî ziman û got: Newtedariya stranê aliyên wê yê erênî û nerênî hene, newteya stranê bi merc û sînordar e, çî di aliyê mozîkjeniyê û çî di aliyê dengbêjiyê de be, strana ne newtkirî mîna mirovê azad e dikare stranê li gor ahengiya dilê xwe bilvîne çî afraz bibe û çî dakeve ber bi jêr de, ji ber wilo bihtirîn ji hinermendên afrêner ne newtexwend bûn, lê strana newtekirî bitir parzûn û terezû kiriye, mînak M.Arif Cezrawî di gelek cihan de ji meqamê der dikeve û awaza stranê neşaz dibibe ev jî ji aliyê nerênîya strana ne newtekir ve.

Di salên 1950-1960'î de hinermendên kurd di bin bandora mozîka Ferîd Etreş, Wed` Essafî, Ebilhelîm Hafiz û Fehed Belan.. HD de mozîka wan ber pêş ket ji wan hinermendan Aramê Dîkran, Seyîd Yosiv, M.Ezîz Şakir û M.Şêxo bûn û asta wan ya stranî pir baş bû, çî di aliyê mozîkjeniyê û çî jî di aliyê gotinê de.

Di vê dema nuha de tevî pêşketina teknîkî, çî ji aliyê amûran ve û Çî jî ji aliyê tomarkirin û Istidiyoyê ve, asta stranî li Rojava nebaş e tevî wê jî bandora mozîka Tirkî jî gelek li wan heye, bi teyibet nîfşên nû yên ku di bin bandora stranên Tirkî de sazvaniyê dikin, ta niha ti berhemên mozîkî ku bikeve çarçoveya stran û mozîka cihanî de nedane.



Li ser codahiya di nav bera strana Newtekirî û ne newtekirî de mamoste Kamîran Ibrahîm dibêje: Ew e dema ku stran tê ber newtê şaşiyên wê stranê derdikevin û cihê şaşiyên xwiya dibe, Ew hinermendê ku di xwendina newteyê de, ne hosta be wê di asta dengbêjiya

gelêrî de bimîne û ti carî nikarbe bi orkêstrayê re bistrêne, ji ber ku orkêstira pabendeke kata mozîkî ye.

Dema ku Ewropiyan Newte sazkirine mebest ew bûye, yekbûna sazvaniya hemû amûrên mozîkê û rêzkirina katên mosîkî jî, bo ne kêma û ne jî zêde ber bi sazê ve herin, dema ku mozîka kurdî bibe orkistralî, nexasim sbaretî parçeyê mozîkê yê dirêj û divêt hemû sazvanî jî zanistê newteyê bin.

ta ku mozîka Kurdî di çarçoveya mozîka Cihanî de cihê xwe bigire divê ku bibe orkistralî, bo Ewropî jî li strana Kurdî guhdar bikin.■

Makder: mamosteyê mozîkê
Kamîran Ibrahîm.



ÇAWA ZIMAN ÇÊBÛ ..?



Imran Yûsiv

Ziman yek ji kevintirîn alavên gihandinê di Znavbera mirovan de ye, ew alava herî karîger û kêrhatî ye ku mirov ew nas kiriye. Bêguman afirandina ziman di dîroka mirovahiyê de gewretirîn şoreş bû.

Gelo ziman çi ye, û çawa çêbûye?

Zanyar û zimannas "Hênrî Swît" ziman dide nasîn û dibêje: "Ziman derbirîna hizir û ramanan bi rêya dangan e". Zanyarê emerîkî "Sapîr" bi gotinek din ziman dide nasîn û dibêje: "Ziman alavek e, bo gihandina hizir û hestan e bi rêya ristek ji nîşanên ku mirov wan bi kar tîne û ew bixwe wan hildibijêre".

Wek ku tê zanîn, mirov afrîndeyeke civakî ye, ango mirov bi tena xwe nikare bijî, lewra yek ji pêdiviyên civaka mirovahiyê yên sereke û bingeîn ziman bû, çimkî ziman pêwendî û gihandinê di navbera endamên yekcivakê de hêsan dike, her wiha têkilî, danûstandin û têgihîştinê di navbera wan de xurtir dike.

Çawa ziman hatiye afirandin?

Da ku em bersiva vê pirsê bidin pêwîste ku em wan dîtin û bîrdozên ku di der barê vê mijarê de derketine binasin, bi rastî gelek dîtin û bîrdoz derbarê zayîna ziman û peydabûna wî derketin, ji wan dîtinan çar bîrdozên sereke û girîng hene ku hêjaye em wan bidin xuyakirin û li pêşberî xwîner raxînin, ew jî ev in:

-Bîrdoz Xwezayî ji afirandina ziman re

Ev bîrdoz dibêje ku ziman yekser ji wan dengên

xwezayî çêbûye, û bi pêşketina hişê mirov re, firebûna civaka mirovî û pîrbûna pêdivî û xwestekên mirovan re û bi avakirina şaristaniyan re, ziman jî hin bi hin bi pêş ketiye.

Li gorî vê dîtinê, mirov pêşî dest bi lûsekirina dengên ku di xwezaya derdora wî de peyda dibûn kiriye, wek awayekî ku bi lûsekirina wan dangan hest û hestwariyên xwe derîne. Mîna dengên taybet bi şahiyê, tirsê, xemgîniyê, hêrsbûnê h.w.d. di heman demê de jî wî lûsekirina dengên diyardeyên xwezayî kir mîna gumguma ba, xumxuma ava çeman, xwişxwşa pelên daran, çipçipa baranê H.w.d. her wiha mirov lûsekirina dengên lawiran jî kir mîna dengê hespan, çivîkan, şêran, guranh.w.d. Mebesta mirov jî vê lûsekirina dangan ew bû ku wan hest û bertekên ku wan dangan pê re çêdikir derbirîne û bigihîne mirovekî din.

Bi vî awayî û ji van hemû dangan ziman hate afirandin, lewra em dikarin bibêjin ku ziman ew deng in ên ku mirov bi wan xwestekên xwe derdibirîne û dertîne.

Xwediyên bîrdoz xwezayî dibêjin ku bingeîn û koka hemû zimanên cîhanê ew deng in ên ku li xwezaya hawîrdora mirov peyda dibûn, bervedêrên vê bîrdozê dîtin xwe tekez dikin û dibêjin ku zimanê mirovê destpêkî nêzêkî dengên xwezayî bû, lewra bêjeyên wî zimanî hindik bûn, nîşana wan li ser vê dîtinê ew e ku heya roja me ya îroj hîn zimanekî wiha li cîm hin êlên ku li Efrîqayê û dûrî jiyana şaristanî dijîn peyda dibe.

Ji aliyekî din ve, û ji ber ku mirov hewcedar bû ku hest û ramanên xwe bi zelalî bigihîne kesê din, û ji ber ku ferhenga wî ya zimanî pir teng bû û gotinên wî pir hindik bûn, lewra nîşanên bi dest û laş jê re bûne alîkar da ku wateya gotinên xwe bêtir bide xuyakirin. Wisa liv û tevgerên laşî bûn mîna awayekî ku bi derbirîna hest û hizirên mirov re bûye têkildar. Bi vî awayî mirov ew valahiya di ziman û bêjeyên wî de bû bi riya liv û nîşanên laşî de dagirt. Lê bi pêşketin û firehbûna

ziman re mirov hin bi hin dest ji wan liv û tevgerên laşî berdida û bikaranîna wan kêr dikiş. Bi vê pêşketinê re guhertin di endamên bilêvkirinê de mîna (ziman, dev û diranan) jî çêdibû. Bêguman, van pêşketin û guhertinên zimanî demeke dirêj xwar.

-Bîrdoza Sirûşa Xwedayî

Xwediyên vê bîrdozê dibêjin ku ziman bi sirûşekê ji ba Xweda peyda bûye, bingeha vê bîrdozê ji bîrûbaweriyên olî û mîtolojiyaya kevnare hatiye, yek ji wan kesên ku di destpêkê de ev dîtin aniye ser ziman fêlezofê yûnanî Hiraklît bûye, piştî ev dîtin di pirtûkên olîyên pîroz de hatiye tekez kirin. pirtûka peymana kevin (Tewrat) dibêje ku piştî Xweda Adem afirandiye ew fêrî hemû nava kiriye, heman gotin di Qurana pîroz de jî hatiye. Lê ev dîtin ne li ser bingeheke zanistî hatiye avakirin, çimkî li gorî vê dîtinê divabû zimanek tenê ji mirovan re heba, ango zimanê ku Xweda ew fêrî Adem kiribû, lê di rastiye de em dibînin ku di her dem û çaxê de gelek ziman hebûn, û îro roj bi sedan ziman li cîhanê hene.

-Bîrdoza sêyem dibêje ku ziman bi riya lihev kirinekê di navbera hin gropên mirovî de hatiye çêkirin, ango her girûpeke mirovî bi zaravêkî diaxivî, û ev zarav nêzîkî hev bûn, di qonaxekê de zaravê herî xurt bi ser ket û karîbû xwe li ser hemû zaravên dîtir feriz

bike, vêga bi rêkeftinekê di navbera girûpên beşdar de serwerî dan vî zaravî û bû zimanê danûstandinê di navbera hemû wan komên mirovî de, û zaravên dîtir tevde di nav de hatin bişaftin.

Ji wan kesên ku bi vî dîtinê bang kirin, di serdemên kevin de fêlezofê yûnanî Dîmoqrat bû, û di serdemên nû de Adem Smît, Divler Stîwa û hin fêlezofên dîtir jî bûn.

-Bîrdoza Arezûya Xweser

Ev bîrdoz dibêje ku her mirovek di civakê de arezûyeke wî ya taybet hebû, ku pê hest, hizir û têgihiştinên xwe yên hestdarî û moralî derdibirandin, û ji her têgihiştineke hestdarî yan moralî re bêje yeke taybet afirand. Ev bêje di endamên yekcivakê de belav bûn, û awayên derbirinê li ba van civakê mirovî yên destpêkî de nêzîkî hev dibûn heya ku bi riya civîna van bêjeyan zimanekî hevbeş di wê civakê de peyda bû. ji wan kesên ku ev dîtin li xwe girtin Maks Moler û zanyarê ferensî Rênyan û xeynî wan bûn.

Piştî ku me her çar bîrdozên sereke ji afirindina ziman re dane xuyakirin, ez dibînim ku bîrdoza xwezayî ji hemiyan berhiştir e û nêzîkî rastiye ye, dêmek ziman ji denga pêk hatiya û li ser denga ava dibe, û bi pêşketina mirov û pîrbûna pêdiviyên civaka mirovî re ziman jî li pêş ketiye. ■



NERÎNA XELKÊ AMÛDÊ DERBARÊ YEKRÊZIYA KURDÎ DE

Efsan Kurdî

“Di 16’ê Hezîranê de şandeya Meclisa Nîştimanî ya Kurdî li Sûriyê û Partiyên Yekitiya Nîştimanî ya Kurdî pêvajoya destpêkê ji diyaloga kurdî bi dawî kirin û bi hev re gihîştin nêrîneke siyasî ya hevbeş.

Her weha herdu şandeyan lihevkin ku bendên (Rêvebirina hevbeş, mijara ewlehî û parastinê) ên Peymana Dihokê ya 2014an ji xwe re bikin bingeş ji bo berdewamkirina dan û standinan û diyalogê di navbera her du şandeyan de.

Her du şandeyan tekezî li ser hevkarî û yekrêziya Kurdî li Sûriyê kir, û ev gav weke gaveke dîrokî ya girîng ber bi lihevkirineke mezintir û hevkarîyeke pratîk ku dikeve xizmeta berjewendiyên gelê Kurd li Sûriyê û hemû pêkhateyên Sûriyê de hate pêşwazîkirin.

Ev lihevkin carek din rihetiyek xist dilê kurdên rojava û hêviyên wan bi yekîtiya mala kurdî ji nû ve vejandin.

Lê heya vê keliyê jî hîn gel ji vê gavê bi gumane û ditirse ku ku ev lihevkin neçe serî û wek carên berê bê xerab kirin.

Derbarê mijara yekrêziya kurdî û lihevkinên dawî de, kovara Welat nêrînên gelê Amûdê şopandin.

Dara Ehmed welatîyek ji amûdê ye, derbarê vê mijarê de ji kovara welat re axivî û got: "Ez dibînim

ev gav li bal her kurdekî cihê rihetiyê ye, ji ber ku îro roj herêmên me di bin gefên dewleta tirk a dagîrker de ye, eger em nebin yek wê ev herêm bi temamî bibe ermanca dagîrkirina wan, em bi hêvî ne ku ev yekîtî zû here serî û em wek milletê kurd bigihên mafên xwe".

Nazdar Elî ku ew jî welatîyek ji amûdê ye nêrîna xwe derbarê vê mijarê de anî ser ziman û got :

"Eger emêrka vê carê bi kurda re rast be û eger ew ji dil dixwaze ku kurd bibin yek wê ev yekîtî here serî, ev yekîtî daxwaza me tevan e û em spasiya Genera Mezlûm Ebdî û serok Berzanî dikin ku piştgiya vê yekîtiyê dikin".

Welatîyê kurd Elî Ezidîn ku ew jî ji şênîyên bajarê Amûdê ye dibêje:

"Gerek ev yekîtî ji berî ku Efrîn û Serê Kaniyê tekevin bin destê dewleta Turk û çeteyên bi ser ve û bîne dagîrkirin, ev yekîtî hatiba avakirin, lê dîsa em bi hêvî ne ku ev yekîtî here serî û neyê xerabkirin wek rêkeftinên berê, em spasiya çi kesê ku bûne piştevan ji vê yekîtiyê re dikin". ■



تتمة المقال: «الرواية الحديثة» لأول رواية كردية مترجمة إلى اللغة الإنكليزية»

الفوضى. و يضيف كول سولاف لاحقا بأن الخيال ليس كالذاكرة. فالخيال هو الواقع!

تقول شخصيات أخرى في الرواية بأن الخيال قوة عظمى تساعد في التغلب على الموت.

باختصار، من الواضح أن «بختيار علي» مؤلف الرواية مدرك بأن للخيال أهمية عظمى لحياة الإنسان و يوضح كتابه هذه الفكرة بجلاء. ولكن لا يحب البارونات الخيال و يسعون إلى شراء كل المخلوقات الخيالية. إن حبكة الرواية معقدة بشكل مذهل و يحتاج إلى صفحات كثير لتليخيصها.

فقد تطرقت فقط إلى «ماجلان الحقيقي» الذي يبحث عن اخته الضالة و التي قد تكون متزوجة بأحد البارونات. و لم أذكر «نادي القتلى» و لا النساء اللواتي تركن عائلاتهن و لا النساء اللواتي أحرقن بالنار و لم أتطرق إلى الطريقة المعقدة التي يستخدمها البارونات لإحكام السيطرة و المحافظة عليها (و لم اذكر دور الولايات المتحدة أيضا).

لم أذكر أيضا الشخصيات التي تغير من شخصياتها و الشخصيات المنفصلة التي تشكل جزءا منها و أغفلت ذكر الكثير من الشخصيات الأخرى التي تلعب دورا مهما في هذا الكتاب.

إنها واحدة من تلك الروايات التي تعرف أنك ستضطر إلى قرائتها مرة أخرى كي تتذوقها بشكل كامل. إن كان لهذا الكتاب موضوع واحد، فهو ما قاله «حسني واسع الخيال» لبارون الخيال:

إن الملوك بحاجة إلى الشعراء لكن الشعراء لا يحتاجون إلى الملوك. و أن الخيال هو أحد أهم الملكات البشرية، و الذين لا يستوعبون هذه الفكرة، لن يحييوا حياة طيبة. ■

بعد أن كبر الاثنان و يرثه ابنه جوهر. يصبح جوهر عنيفا و يهدد أمه فوزية و اخته طريفة بالقتل. تهرب طريفة من القتل و تلجأ إلى مصنع للسجاد.

يشهد مصنع السجاد نجاحا لا بأس به إلى أن جاءت طريفة إليه و أضافت إليه شيئا جديدا. فقد صنعت طريفة سجادا خاليا رائعا. حققت سجادات طريفة نجاحا كبيرا و كان له تأثير عظيم و إيجابي على الموظفين. يجذب هذا حتما انتباه البارونات و لا سيما بارون الخيال.

إحدى الشخصيات الرئيسية الأخرى في الرواية هي شخصية عطار. لا يكسب عطار هذا رزقه من تجارة البضائع بل من الاتجار بالبشر. فإن كنت تبحث عن شخص ذو مهارة محددة لأي غرض في نفسك، فسيجده العطار لك. فعطار ماهر في هذا الشيء لدرجة أنه اشترى أطفالا يتمتعون بمهارات نادرة من والديهم، و رعاهم جيدا ثم استخدمهم لمآربه.

عطار هو أيضا من عثر على «دارسم طاهر» الذي يتمتع بموهبة شم الجثث المدفونة و استخدمه العطار لاحقا لأحد أغراضه. حيث استخدمه الجيش العراقي فيما بعد في الحرب العراقية الإيرانية. و دارسم هذا هو من وجد ريح جثة «مراد جميل»، الذي تمت تصفيته، و عثر عليها في بداية الرواية.

دارسم هو أيضا من الأسباب التي شجعت أبطالنا الثلاثة و غيرهم لمواصلة تحقيقاتهم.

هذا و للعطار دور آخر أيضا في الرواية. حيث تطلب منه إحدى الأسر الغنية العثور على مدرس للخيال لابنتهم «مهناز». مهناز ابنة رجل غني و أمها مصممة أن تكمل ابنتها الدراسة في الجامعة كما يفعل جميع أطفال صديقاتها. و على الرغم أن مهناز ليست غنية، لكن يبدو أنها لا تتعلم. ينصحهم أحد مدرسي مهناز بأنها بحاجة إلى معلم خيال. و هكذا يتم الاستعانة بالعطار للعثور على مثل هذا الشخص. يواجه عطار صعوبات كثيرة و لكنه ينجح في أن يجلب شخصين هما: غزلنوس و طريفة.

الخيال هو مفتاح فهم هذا الكتاب. فهو كتاب خيالي للغاية و تتم الإشارة غير مرة إلى أهمية الخيال. فالخيال مهم في تعليم مهناز و في قصائد غزلنوس و سجادات طريفة و في رحلات مجيدي كول سولاف الخيالية.

و لكن ماذا لو كان العمل خاليا من الخيال؟ يتسائل مؤلف الكتاب معلقا على سجادات طريفة

يجيب المؤلف: يقترب الشخص من الموت إن كان عمله خاليا من الخيال بغض النظر عن المرحلة التاريخية التي يعيش فيها. و هذا ما يوصي به «الملا سوخته» أحد آباء غزلنوس المزعومين في رسالته إلى غزلنوس. حيث يقول له بأنه بحاجة إلى الخيال لفهم الحقيقة. و لكن يوضح مجيدي كول سولاف بأن هناك خطأ واضحا بين الخيال و الحقيقة. و إذا أزلنا هذا الخط، فإن العالم سيغرق في حالة من

1991.

هؤلاء الأبطال هم ثلاثة مؤلفين يعطي كل واحد منهم عنوانا للكتاب. أحدهم يسمي الكتاب بكتاب «الألف جثة» و الآخر يسميه بكتاب «حديقة الدم» و الثالث يسميه بكتاب «دفتر الجحيم».

كتاب يجلب الغم و الشيخوخة لمؤلفيه و يجلب أسأ عميقا لقارئيه. فهو كتاب الحزن و التعاسة كما يقول أحد المؤلفين الثلاثة.

يجعلنا هذا الكتاب بمجرد كتابته نشعر بأننا ودعنا الملائكة و الشياطين من أرواحنا و أننا قد فتحنا الباب أمام العواصف المظلمة و أمام الحداثق المليئة بالأسرار و الدروب المظلمة في قلوبنا.

«المؤلفون الرئيسيون الثلاثة هم: «مجدي كول سولاف المعروف باسم «ماجلان الخيالي». و «بهمن ناصر» المعروف باسم «غزنوس» و «طريفة يابهر».

يُطلق لقب «ماجلان» على كل من كان كثير الأسفار. (لاحقا سنقابل شخصية أخرى تُسمى «الماجلان الحقيقي»). لم يغادر بطلنا «مجدي كول سولاف» بلاده أبدا، غير أنه قد جال العالم رفقة مجموعة من الأطفال العميان، بالتحديد العالم الخيالي أي الأماكن الغير موجودة في العالم الحقيقي. مجدي سولاف هو من يقرر أولا أن المجموعة يجب أن تبحث عن البارونات مُدركا الخطر الذي قد يجلبه هذا القرار ، ولكنه مدرك أيضا بأن البارونات هم مفتاح حل لغز الكثير من الوفيات.

قد يكون غزنوس الشخصية الرئيسية في الرواية. و يُطلق عليه هذا اللقب لأنه يكتب و يجمع أشعار الغزل. ولادة غزنوس غريبة مثل غرابة الأخبار التي تروى عن الأبطال الأخيار. يكتشف غزنوس لاحقا خبرا شبه مؤكد بأن الرجل الفقير الذي رباه ليس والده الحقيقي.

في الواقع، قد يكون والده الحقيقي عبارة عن شخصين هما وجهين لعملة واحدة. (يتلقى غزنوس رسالة من كلا والديه قبل موتهم. يمر غزنوس بلحظة تجلي مباشرة بعد تلقيه رسالة والده الثاني. يوقظ هذا التجلي فيه معنى الحب الشامل)

يتبى غزنوس طفلا من امرأة مجهولة قبيل وفاتها و يعتبره ابنا و أخا له! يتحول غزنوس إلى معلم للخيال لفترة وجيزة.

ولادة البطلة الثالثة «طريفة» غريبة أيضا.

تحمل «فوزية» من زوجها «زاهر آغا» و تلد ابنا. لزاهر آغا أخت سيئة المعشر اسمها «سميرة». تغار سميرة من أخيها زاهر الساحر و الوسيم. يعرض زاهر الذي كان كبير العائلة الكثير من الخاطبين على أخته سميرة. لكنها ترفضهم جميعا بعد أن قطعت وعدا على نفسها بعدم الزواج. عندما حملت فوزية زوجة زاهر بعد سنين من المحاولة، تحمل سميرة أيضا بالرغم من تأكدها بأنها ما تزال عذراء. تلد فوزية مولودها «جوهر» و الذي ينشأ ليتحول إلى إنسان بغيض. بينما تلد سميرة «طريفة». و لتلافي العار تقرر العائلة تنشئة طريفة كأخت توأم لجوهر.

تُفضل فوزية التي ربت الأثنين سميرة على ابنها جوهر. يموت زاهر

«الرواية الحديثة»

لأول رواية كردية

مترجمة إلى اللغة

الإنكليزية

قراءة لموقع

The Modern Novel

ترجمة : محمد رمضان

العنوان الأصلي للرواية: «غزنوس و حداثق الخيال»

عنوان الرواية المترجمة إلى الإنكليزية: «نظرت مليا إلى ليل المدينة» للكاتب الكردي العراقي: بختيار علي

إن كنت بحاجة إلى دليل على عدم اقتصار الواقعية السحرية على روايات أمريكا اللاتينية، فإن هذه الرواية هو خير مثال.

هذه الرواية مهرجان بديع من الألوان و زاهر بالحيوية من ربوع كردستان. رواية مليئة بالسخرية و المغامرات المذهلة. على الرغم من أنها رواية واقعية سحرية لكنها تحمل في الوقت ذاته رسالة شديدة الجدية لمواجهة الوضع السياسي في كردستان.

تتناول الرواية، كغيرها من العديد من الروايات، موضوعين رئيسيين هما الموت و الخيال.

حبكة الرواية مذهلة التعقيد، فيها قصص عديدة مختلفة تضم شخصيات كثيرة تتحدى تركيز القارئ.

الرواية:

تُدار البلاد فعليا، في غفلة من معظم الأكراد، من قبل مجموعة من البارونات. يخفي هؤلاء البارونات شخصياتهم عن قصد كي لا يتعرف إليهم أحد و خاصة أسمائهم. يكسب البارونات المال بطرق متنوعة بالاعتماد على الفساد حيث يعملون بشكل وثيق مع المسؤولين الحكوميين و وزراء الحكومة.

يُلقب هؤلاء البارونات بألقاب غريبة. فمثلا، هناك بارون الخيال و هناك بارون الباذنجان و آخر يلقب ببارون الدجاج.

على الجهة المقابلة، يؤلف أبطال الرواية كتابا عن الأموات يكتبون فيه بشكل خاص عن قصص أولئك الذين ماتوا بعد انتفاضة عام

HEJAR MUKIRYANÎ (1921-1991)

Ronakbîr û wêjevanê kurd Hejar Mukiryanî li bajarê Mehebadê yê rojhilatê Kurdistanê di sala 1921ê de ji dayik bûye. Navê wî Ebdulrehman Hacî Mele Mustefayê Şerefkendî ye. di maleke oldar û rewşenbîr de mezin bû.

Ji zarotiya xwe ve guhdan bi zimanê kurdî kir, wêjeya kurdî bi kûrahî xwend û bû yek ji helbestvanên kurd ên navdar.

Helbestvan û wêjevanê kurd yê navdar Nalî Hacî Qadirê Kewî yek ji mamoteyên wî yê wêjeya kurdî bû.

Di temenê 25 salaiya xwe de û li gel Hêmen Mukiryanî beşdarî yekemîn wezaretê ragihandinê ya kurdî bû, ku ew yek ji wezaretên hikûmeta komara Mehabadê bû. û roleke berz û bilind di belavkirina çand û wêjeya kurdî de lîst.

Piştî rûxandina komara Mehabadê, Hejar ji welêt hate dûrxistin, û li Bexda, Kerkûk, Silêmanî, Şam û Beyrûtê geriya.

Piraniya helbestên xwe di kovarên (Niştiman û Halala) de weşandin.

Di sala 1953an de wek nûnerê gelê kurd di mihrcana ciwanan ya cîhanî de ku li bajarê Boxaristê li dar ket beşdar bû. piştê serdana Yekîtiya Sovyêta berê kir, rûmeta endametiya Yekîtiya Nivîskarên Ezerbêcanê ji bo wî hate dan.

Gelek zehmetî û dijwarî di jiyana xwe de dît, lê wî gelek sûd ji gera xwe wergirt, bi taybetî di warê zanîna zaravên zimanê kurdî de û berhevkirina wan de.

Şoreşa êlûnê ya başûrê kurdistanê (1961-



1975) jiyan kir, û li nik Berzaniyê nemir rojine geş derbas kirin, her wiha şoreşa 26ê gulanê jî şopand.

Dora 50 salî li ser hev kar û xebateke bêhimpa ji bo xizmeta doza kurdî kir.

Berhemên wî :

-Ferhena Kurdî-Kurdî-Farisî, ev mezintirîn û firehtirîn ferhenga kurdî ye ku ji zêdetirî 70 hezar peyv himbêz dike.

-Ravekirina Qurana pîroz vi zimanê kurdî.

-Dîwana yeke- Helbest (Ji bo Kurdistan)

-Wergêr û pêkanîna Şerefnameya Bedlîsî.

-Pêkanîna dîwana mîrê helbesta kurdî Melayê Cizîrî.

-Dîwana (Ala Kok) 1945.

-Pirtûkek li ser dîroka bajarê Silêmaniyê.

-Wergerandina çariyên Xeyam.

-Çapek balkêş ji dastana Mem û Zîn re, berhevkirin û ravekirina malikan bi hemû zaravên kurdî û ji nû ve hûnandin û ristin bi zaravê soraniya mukiryanî. ■

FERHENGOK

camêr	الرجل الفاضل
jixwerazî	متكبر
ciwan	جميل
Kirêt	قبيح
jîr	ذكي
bêhiş	غبي
nankor	ناكر للجميل
spasdar	ممنون
wêrek	شجاع
Tirsonek, bêzirav	جبان
rastgo	صادق
derewîn	كاذب
merd	كريم
çikûz	بخيل
çavnebar	حقود
dilnêrm	متواضع
kîndar	حاقد
hezker	محب
Durû	منافق
keysebaz	انتهازي



تنمة المقال: من العزلة... إلى التأمل...!!!

البحر و السماء، في الخالق، في ماضي الإنسان، في حاضره، و مستقبله، ذاك التأمل كان مدخلا لتغيرات عظيمة و كبيرة في حياة المجتمعات فيما بعد، و لا زال التأمل فرصة لتحرير العقل و التفكير بامعان في نقطة هناك تبدو ضبابية، حتى يتم كشفها و تفسيرها، و الاقتراب، و ربما الوصول لكنهها، و الغوص في عمقها و كشف خباياها.

هذه العزلة لعبت دورها في أن أعود إلى نفسي و أغوص في عمقها، أن أتأمل من جديد الزمن الذي مضى، و الزمن الذي سيأتي، تأملت حقيقة الحياة الهشة، و كيف ان فيروسا قزما تافها حقيرا قادر أن يحول حياة سكان كوكب بأكمله إلى كابوس او موت محقق، من شرقه إلى غربه و من جنوبه إلى شماله... اي شرق و اي غرب، انها كرة أرضية لا شرقها شرق و لا غربها غرب و إنما هي كرة كانت من الأجدى أن تكون أممية واحدة حكومة إدارية واحدة ... هذا الكوكب الأخضر الجميل ببحاره، و غاباته و أنهاره، و وديانه و جباله، بشره و حيواناته و طيوره، بسهوله، و صحاريه، و ثلوجه، بأرضه و سماءه...

كان عليه أن يكون دون حروب، دون سجون، دون قتل، بلا تفرقة، بلا تميز، وحتما كان سيكون بلا أمراض، و بلا جوعى...
كان سيكون هناك الحب..

نعم الحب..

أنا الآن أحب الحياة جدا

أحب ابتسامة قد أراها على وجه أي من أولادي

أحب أمي وأبي كما لو كنت طفلة لم أر سواهما

أحب النرجس على شرفتي

وبشدة أحب كل ما كتبت منذ الثامنة عشرة من عمري حتى الآن ... اذاً أنا لازلت أحياء.

ابقوا بحب ■



فيروز رشك

من العزلة... إلى التأمل...!!
عن العزلة...، و أشياء أخرى
و عن الحب..؟.

«الحب الأول لا يموت بل يأتي الحب الحقيقي
ليد فنه»

(محمود درويش)

اليوم الخامس عشر من حظر التجول

العزلة

كانت و على الدوام مفروضة
بأمر ما، أن تعزل عن بيتك أو
مجتمعك، أو أن تنعزل كقرار تتخذه انت... لن
أطيل فلربما لعبت العزلة دورا في أن أثرت أكثر، و
لكم أن تمضوا معي لسماع ثرتي أو تدعوني أن
أغوص في عمق الفكرة أو احلق في سماء الفكر و
التأمل، و لست أول إنسانة أتأمل العالم، لست
آخر متألمة في هذا الكوكب، فأغلب الأنبياء
انعزلو و مارسوا العزلة، و الفلاسفة و الشعراء، و
على مر التاريخ، حتى هناك من اتخذ العراء و
البراري ملاذا له و لجنونه.

كانت العزلة سجنا، حيث يعزل فيه الإنسان
كعقاب و تذكر الكتب القديمة أن «مُروود» هو
من ابتكر عقوبة العزلة و السجن الأفرادي،
و لا زال السجن رمز لسلطة قانون أزي، سلطة
ليست محقة دوما في ممارسة هذا (الحق) ضد
إنسان أو مجموعة بشرية، السجناء هم أكثر
الناس عزلة، و نفوسهم تتوق للحرية، للخروج
من العزلة المفروضة، لكن هناك من فرض على
نفسه العزلة فانعزل عن الناس و مضى وحيدا إلى
خلاء، إلى عراء شاسع و ربما صعد الجبال و سكن
كهوفه، أو مغاوره، و كان منهم الأنبياء و النساك
و المتعبدين من أديان مختلفة لعل أبرزهم
المسيحيين الأوائل الذين بنوا و أشادوا كنائس في
ذرى الجبال أو في جوف الأرض خشية من سلطة
مارست أدوار القهر ضد دينهم أو عقيدتهم، و

لازال أتباع الديانة البوذية يمارسون الانعزال، و قد
ظهرت الانعزالية كمذهب فلسفي، كما المعتزلة
الذين اعتزلوا عقيدة عامة و تمسكوا بعقيدة
جديدة، نتيجة صراعات مذهبية أو شخصية حول
السلطة، و مانعشه الآن من حجر منزلي هو أشبه
مايكون بممارسة العزلة، أو فرض العزلة لدرء
خطر قادم، و ربما لن يأتي، و نأمل الا يأتي ذاك
الزائر غير المرغوب به....

إذاً نحن معزولون بمعنى ما، لكننا نتواصل مع
الآخرين عبر وسائل التواصل الاجتماعي، فإلى أي
حد يمكننا أن نصف أنفسنا، أهو عزل أو تواصل؟؟.

و ربما يأتي قائل و يدلي بدلوه قائلا: «هذا ليس
تواصل اجتماعيا، و انما تباعدا اجتماعيا» و ربما
كان في قوله وجهة نظر...

هكذا منذ الصباح و أنا في عزلي خطرت ببالي
هكذا افكار وتدايعات...، رغم أنني أمارس الحب
لحظة بلحظة

الشفيرة المقابلة للعزلة هي ممارسة التأمل، نعم
التأمل وهو أعمال الفكر في اتجاه تفسير الظواهر
و تحليل العقد، و الوصول لحكم ما أو حكمة ما،
و لهذا نشأت الفلسفة التأملية، و الإبداع التأملي،
فكل من طلب الانعزال عن مجتمعه كان هدفه
أن يبقى وحيدا، يتأمل في الطبيعة، في الأصوات،
في الألوان، في طبيعة البشر، و النبات و الصخر و



Ş Ê R Î N

D A W I D :

«Hunermend êşa xwe ya hundirîn xêz dike û li ser tabloyê radixîne, da ku yê bîner wê êşê bi çavên xwe bixwîne»

Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

Hunermend û şêwekara kurd Şêrîn Dawid ji bajarê Qamişloyê ye, derçûya zanîngeha Şamê beşê wêjeya inglîzî ye, du salan li peymangeha Edhem Simayîl hunera şêwekariya xwendiyê.

-Çawa tu derbasî warê hunera şêwekariyê bûyî, derbarê wan destpêkan de tu çi dikarî ji me re bibêjî ?

-Ji zarotiya min ve, min hez ji wênekêşiyê û nivîskêşiyê dikir. Vê yekê hişt ku kes û karên min guh bidin behreya min, li dibistanê jî mamosteyên min guhdan bi behreya min kirin û han bi min dan, pêşengeh ji min re vekirin û ronahî dan ser tabloyên min di wê qonaxa zarotiya min de. navê min hildibijartin da ku ez beşdarî pêşbirkên wênekêşiyê bibim, du salan li ser hev min pila



yekem li ser asta parêzgehê bidest xist, piştê û ji bo xwendina xwe ez nema beşdar bûm.

-Folklor û jîngeha kurdî bi xurtî cihê xwe di tabloyên we de digirin heya radêya ku ew dîkin ji wan re bibin nîşan, gelo raza wê têkiliyê ji ku hatiye û çi bandor li Şêrîna hunermend kiriye ?

- Ji ber ku ez keçeke gundî me, geh li gund û geh bajar jiyame, lewra xeyal û sawêra min bi xweza û jîngeha kurdî ya li devera cizîrê ve girêdayî ye. bi geşbûna buhara wê xwezayê û zuhabûna havîna wê ve. Mezinbûna min di nav wê jîngeha gundewarî de, sîmayê taybetmendiya folklorê kurdê da ser tabloyên min. û tiştê ku min

dixwest ez bigihême ji destpêka ku min bi rengan xêz kir ev bû. ez her tiştê ku kultor û folklorê kurdî nîşan dide xêz dikim, û ez bi vê kultorê serbilind im.

- Di tabloyên te de du şewazên hunerî xuya dibin, ew jî şewaza derbirînê û şewaza cîwerê ne. Gelo çi di van her du şewazan de te dikişîne, û ji kîjanê bêtir tu hez dikî ?

-Ez ji şewaza cîwerê hez dikim, û dixwazim xwe li ser vê şewazê zêdetir rahênan bikim da ku ez bigihêjim baştirîn ast. Piraniya şewekarên kurd şewaza razberî (tecrîdî) ku ji bîner re nezela e bi kar tînin, lewra min xwest hinek hizir û kevneşopên kurdî bi riya tabloyên xwe yên cîwerê ji nîfşê nû re veguhêzim. Ez dibînim ku wênekêşî tenê ji bo

bîneran e, lewra divê yê bîner tiştê ku di tabloyê de bibîne têbigihêje û fam bike.

-Jin jî di tabloyên we de amade ye, gelo kî ne ew jinên ku tu wan dixî tabloyên xwe, û bi rêya wan tu dixwazî çi bibêjî?

-Bêguman hûn dibînin ku her şewekarek jinê di tabloyên xwe de bi kar tîne, gelek şewekarên cîhanî, ereb û kurd jin ji xwe re kirine şewazeke hunerî. Ez ji şeweyê jinê hez dikim, bi taybetî jina kurd bi cil û bergên wê yên rengîn û fireh, ku bi reng û neqşên xwe geşbîniyê çêdikin û taybetmendiya kurdî ji gelên din re diyar dikin... û ji ber ku jina kurd weke dê, şervan û perwerdekar xwedan ciyawazî ye, min hez kir ku di tabloyên xwe de qedr û nîrxê wê bigitim û bidim diyarkirin.

-Diyar e ku hûn guhdanê bi wênekêşkirina mirov dikin, gelo hûn wan kesayetên tabloyên xwe ji ku werdigirin, û çi nameyê hûn dixwazin ku di riya wan re bigihînin?

-Tiştê herî zêde ku bala min dikişîne, dîtina pîr û kalan e, rûniştina li gel wan e, û girtina wêneyên wan e. rûyên wan wateya jiyanê didine te, tu êş, azar û dîrokê di wan de dibînî. Ew rûdêm bi wan qermîçokên xwe yên kûr û kolayî, min ber bi wênekêşiyê ve dikişînin, da ku ez wan rûdêman



derbirînim, û da ku ez li ser dîroka êş û azariyên wan bi wênekêşiyê û bêaxaftin bixivim.

-Hin kes dibêjin ku huner nameyek e, û hin jî dibêjin ku huner tenê ji bo hunerê ye. Şêrîn çi dibêje?

-Ez dibînim ku huner nameyek e, rola wê ew e ku azarên kesê hunermend an azarên gelê wî veguhêze. Mînaka vê yekê ew e ku hunermend êşa xwe ya hundirîn xêz dike, û li ser tabloyê radixîne, da ku yê bîner wê êşê bi çavên xwe bixwîne.

Her wiha wênekêşî nameyek ji bo gelên din e, hunermendê kurd ew zulm û sitema ku gelê wî di dîrokê de dîtiye xêz dikir, aniha jî di cengê de û di dema dagîrkirina dewleta Tyrkiyê ji deverên me re û şewitandina zeviyên me gelek hunermendan bi riya tabloyên xwe ev sitemkarî derbirandin... nexwe huner nameyeke mirovahî ye ku ji gelên din re

û ji cîhanê re tête şandin.

- Tu rewşa hunera şewekariyê ya Sûrî bi giştî û ya kurdî bi taybetî çawa dinirxîn?

- Berî rewşa şer tevgera hunera şewekariyê li Sûriyê çalak bû, û tevgera hunerî ya çalak li Şamê û li navendên çandeyî peyda dibû. Tevî astengkirina azadiya derbirînê, lê te dikarîbû hin piştgiyê bi dest bixî çimkî tevgera çandî li paytextê çalak bû... lê di baweriya min de ev tevger piştî şer pir kêmbûye.

Lê derbarê rewşa hunera kurdî, îro roj tevgera hunera şewekariyê ya kurdî, bi taybetî li derveyî welêt pir çalak bûye, komeleyên hunerî hatine avakirin, guhdan bi hunermendên kurd çêbûye, bi taybetî ji hêla alavên ragihandinê yên kurdî ve û bi riya torên pêwendiyên civakî yên li ser enternê. Vê yekê derfet li pêşiya



hunermend vekir ku bête naskirin û berhemên wî belav bibin, her weha han pê da ku guhdanê bi behreya xwe bike, xwe li pêş bixe û riya xwe berdewam bike, çimkî belavbûna karên wî nameya wî pêktîne.

-Ji bo pêşerojê, çi projeyên we hene?

-Ez dixwazim hin pêşengehên tekane, li vir li Ewropayê, li Kurdisatana Iraqê û li Kurdistana Sûriyê vekim, her wiha ez hêvî dikim ku şewazeke min a taybet di hunerî de çêbibe ku ez pê ji hunermendên dîtir cuda bim, û ez dixwazim li gorî hêviya şopînerên karên xwe bim.

-Gotina we ya dawî?

-Ji bo guhdana we ya bi hunerê û bi hunermendan, û ji bo ronîkirina we ji karê min re, ez spasiya we dikim. ■



٤

تعالى نتعرى كالأشجار

نُسْقُطُ أوراقنا عنا

و في مراياها،

فلتنظر الينا الحياة !!

٥

الدم لا يسمح

من دون جسدك الغض

كل شيء تداخل

٦

ما عدتُ أستطيع أن أقولك

الحديقة، يد الخضار، أصابع الماء

الرسام

لا يستطيع أن يجدك فيي

يتعجب

-مع مَنْ يتحدث هذا ؟

٧

دروب ما قبل المساء الضيقة

أهمُّ أن أذكر أسماء المدن أيضاً ؟!!

البلاب في بعض الأفنية

يميل على الحيطان

صبايا بأثوابٍ بألوانٍ

مازالت في مخيلتي -

صفراء و حمراء

ترى هل كنتَ بينها ؟

منذ عدة أعوام، و أنا أطرح هذا السؤال

على نفسي

ما بين عينيك

سيجن جنونك و ثورين ..

لا دروب أمامك

فقط تستطيعين أن تختبئي في

عيون

موسيقى ما بعد ظهيرة ما، أو

في لحظة من لحظات أواخر

الفصول

ستهريين

و دوماً بحزن ستأملين الطيور

و كلما ستشاهدين جمالا

ألف مرة أمامه

ستنكسرين

و دمك سيسقي كل ورود العالم

حتى تجفّي و تصبحين أنتِ

نفسك

قصيدة

و دائماً

أجد نفسي بين التأكيد و النفي

!!..

٨

ماذا ستفعل بك القصيدة

ستترك دحاناً حولك

ستلبسك قميصاً مشقوقاً

و بنطالاً مهترئاً

ستأخذك الى المياه، ثم عطشه و

جائعة

على الطرقات سترميك

و دوماً عندما يضرب الخريف

بجناحيه جبينك

بالدموع ستعيدين له أجنحته

و عندما يضرب الصيف بشمسه

أنا أصنع قصيدة

عبد الرحمن عفيف

ترجمة عن الكردية : عمران يوسف

١

الأشجار طويلة كما هي دوماً
الشمس وحيدة، محتاجة للبشر
على التلة متمددة

٢

أنا و أنتِ
كل منا في منزله
أنتِ تعدين الشاي و
أنا أغلي نفسي لكِ :
أنا أصنع قصيدة

٣

ما عدتُ أرى طعم نهديك
عيونك التي تشبه الخواتم
ما عادت تنطفئ

عبد الرحمن عفيف شاعر كردي سوري من مدينة عامودا لديه
العديد من الدواوين

Şêrîn Dawîd:

"Hunermend êşa xwe ya hundirîn xêz dike û
li ser tabloyê radixîne, da ku yê bîner wê êşe
bi çavên xwe bixwîne"



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٧٤) ٢٠٢٠/٥/١ م